Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (263) | Sibat / 15-02-2024

# Hejarî li Kurdistana Sûriyê gelekî zêde bûye



Kurdistan

Piştî sala 2011'an, rewşa xelkê Sûriyê bi tevahî û yên Kurdistana Sûriyê bi taybet ji aliyê abûrî ve gelekî xerab bûye, û ji ber vê yekê jî rêjeya hejariyê di nava xelkê me de gelekî zêde bûye, malbat bi zehmetî debara jiyana xwe bidest dixin, ew jî ji ber nebûna kar yan mûçeyê kêm yên ku werdigrin. Rojnameya Kurdistan di vê derbarê nerînên welatiyan wergirtiye.

> «Karê rêxistinên mirovî lawaz e»

Welatiyekî bajarê Qamişlo wiha di vê derbarê de dibêje"Ji ber nebûna kar û bêkariyê, hejarî gelekî li Kurdistana Sûriyê zêde bûye, û ev yek rewşa gelek malbatan zehmet kiriye û bi zehmetî jiyana xwe ya rojane derbas dikin, ew jiyana derbas dikin jiyaneke normal e, û tenê hin pêwêstiyên sereke bidest dixin"

Welatiyekî din dibêje"Mûçeyê fermanberan gelekî kêm e û têra malbatan nake, herwiha ewê karê dest jî dike, gelek caran karbidest wî nakeve, ev hemû sedem dihêlin ku malbat di rewşeke gelekî xerab de jiyana xwe ya rojane derbas bikin, ev malbat hemû di jêr hêla hejariyê de ne û pêwîstiya wan bi alîkariyan heye heta ku ji vê jiyanê rizgar bibin, û bi hewceyî ti kesî nebin"

Welatiyek jî wiha li ser vê diyardeyê dibêje"Desthilata heyî li Kurdistana Sûriyê, alîkariya malbatên hejar nake, û tenê alîkariya wan malbatên nêzîkî xwe dike û ew jî gelekî kêm e, niha li devera me gelek malbat sêwî û bê semyan hene, û rewşa wan gelekî xerab û ti kes û alî û dezgeh guh li wan nake, rêxistinên mirovî yên li deverê kar dikin ne li gor wê asta pêwîst in, û gendeliyeke mezin di nava van rêxistinan de heye, û pêwîste karê wan were rêkxistin heta ku bi hewara xelkê hejar ve biçin, bi rastî pêwîstiya devera me bi Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî heye”

## Karvedanên egera vekişandina Emerîka ji Sûriyê



Ev demeke behsa vekişandina hêzên Emerîkî ji Sûriyê û Îraqê tê kirin, tevî ku berpirsên Emerîkî bi xwe ev yek ranegihandine. Grûpên çekdar yên ser bi Îranê ve berdewam baregeh û bingehên Emerîka çi li Sûriyê û Îraqê dikin armanc, mebesta wan ji van êrîşan ew e ku Emerîka neçar bikin ji navçeyê vekişe û meydanê ji bo wan vala bike. Rû...3

**Zêdetir bixwîne...**

Salek piştî erdhejê — Rûpel—2

Kezî zerê — Rûpel—4

# Salek piştî erdhejê

Kurdistan
Hêvî Delî - Qamişlo

Erdheja 6’ê Sibata 2023’an, çîrokeke pir bi êş û xemgînî li peyî xwe dihêle, çîroka qêrîna zarokan û hewara dayîkan di bin kavilên wêrankirî de û li ber seqem û serma zivistanê û di şeveke tarî û bêdeng de dihate bihîstin. Ku di 6’ê Sibata 2023’an de, demjimêr 4’ê sibehê, erdhejeke bi hêza 7.7 pileyê Rêxterê li Bakurê Kurdistanê çêbû û bandoreke mezin li bakurê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê kir û zêdetirî 59 hezar kes bûne qurbanî.

> **«Divê bêhtir alîkariya Cindirêsê were kirin»**

Herêm û bajarên Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê ku ji ber erdhejê bandor li wan hate kirin mîna : Efrîn, Kobanê, Serê Kaniyê , Cindirêsê, Heleb, Lazqiyê, Hema, Tertûs û Îdlibê ,ku gelek avahî, dibistan, hilweşiyan û wêran bûn û bi hezaran xanî zirar dîtin û bi sedan kes bûna qurbaniyên erdheja wêranker, û herwiha navçeya Cindirêsê ya bi ser Efrîna Kurdistana Sûriyê ve yek ji wan navçeya ku herî zêde zirara erdhejê gihiştiyê de, ku nêzîkî 1354 kesan jiyana xwe ji dest dan, ji bilî vê 489 avahî jî bi temamî hatin rûxandin , di demekê de ku Efrîn û gundewarên wê di bin destê çekdaran de ye, rewşeke pir aloz de derbas dibûn, lê Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî xwedî li gelê xwe ve derketin û bi hewara birayên xwe yên Cendirêsê ve hatin û alîkariyên mirovî ji wan re pêşkêşkirin, ku di 10 Sibata 2023an, Xêrxwaziya Barzanî yekem Dezgeha Kurdî bû derbasî nava xaka Efrîna Rojavayê Kurdistanê bû ji bo alîkarî û hevkariya qurbaniyan û zirardîtiyên erdhejê re bikin, û xelkên Efrînê bi alaya Kurdistanê pêşwazîya wan kirin, û di 19 .2 .2023, Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî bi fermî ofîsa xwe li navenda bajarê Efrînê vekir ji bo berdewamiya pêşkêşkirina alîkariyan ji bo malbatên tûşî zirarên erdhejê hatine bikin.



> **«Karesata 6› sibatê birînek nayê jibîrkirin»**

Û ji aliyê xwe ve jî Partiya Demoqrata Kurdistan Sûriya bi dest hilmeteke komkirina alîkariyan kirin ku ji Cilûberg, Betanî, Xwarin, tiştiên pêwîst yên pêdeviyên mirovan pêk dihat. * Û herwiha di derbarî amarên hejmara qurbaniyên Erdhejê: Û di vê derbarê de hejmara amarên qurbaniyên erdhejê li gor Tîma hevrêzên Bersivdana Sûriyê” ku di raporta xwe de bibelge kir li navçeyên bakurê Rojavayê Sûriyê hejmara malbatên tûşî zirarên erdhejê hatine gihiştiye 334 hezar û 821 malbatan ku hejmara wan bi giştî 1 milyon û 843 hezar û 911 kes e .

Tîmê di raporta xwe de bal kişande ser wê yekê ku erdhejê bûye sedema koçberkirina 48 hezar û 122 malbatan bi giştî 311 hezar û 662 kes, ku ji wan zarok, jin û herwiha yên xwedan rewşên taybet %67ê hejmara wan pêk tê, û diyar kir ku zêdetirî 51 hezar û 931 kes ji xelkê bandor bûne, ji ber ziyanên gihiştine malên wan hîn jî bi hezaran malbat di navend û kampan de dijîn di nav rewşeke dijwar û metirsîdar de nexasim kirîza ku milet ev 13 sala welatiyên Sûriyê têde derbas dibin ji şer û pevçûn û kirîza aborî ku rêjaya 90 ji sedî dibin hêla hejariyê de dijîn , û ji aliyê xwe ve Rêxistina navdewletî di raporteke xwe de amaja bi wê yekê kir ku erdheja Sibata 2023an, bandor li ser rewşa 4.1 milyon mirovên ku girêdayî alîkariyên mirovî ne li bakurê Rojavayî Sûriyê kiriye û rewşa wan zehmetir bûye, ji hemû aliyên peydakirina xizmetguzariyên pêwîst ên jiyanê, bi taybetî bandoreke mezin li ser rewşa zaroka jî hatiye kirin, rêjeyek mezin ji zarokan tûşî pirsgirêkên tenduristî û derûnî bûne, ji xerabûna nexwarina tund,tunebûna dibistan, piştî rawestandina alîkariyên ku ji aliyê Bernameya Xwarinê ya Cîhanî ve li ser navçeyên ku erdhej lê zerar dîtine dihate kirin, herwiha ji aliyekî din ve tunebûna ewlehî û aramiyê li Sûriyê bi giştî, ji ber ku ev yek dihêle derfetên astengiyê û kêşeyên li pêşiya mirov derdikevin aloztir bibe, û tê zanîn ku heta niha piştî salek ji erdhejê xelkên Efrînê û Bakurê Rojavayê Sûriyê pêwîetiya wan bi alîkariyan heye. Hêjeye gotinê di salvegera yekem ya vê karesatê de, malbatên qurbaniyan bi vêxistina mûman qurbanî û ev karesat bibîr anîn.

> **«Dezgeha Xêrxwaziya Barzanî bi hewara xelkê Efrînê ve çû»**





# Egera vekişandina Emerîka ji Sûriyê û bandorên wê

Kurdistan

Ev demeke behsa vekişandina hêzên Emerîkî ji Sûriyê û Îraqê tê kirin, tevî ku berpirsên Emerîkî bi xwe ev yek ranegihandine.

> «Pêwêste Emerîka sîstema bergiriyê li Herêma Kurdistanê bicih bike»

Grûpên çekdar yên ser bi Îranê ve berdewam baregeh û bingehên Emerîka çi li Sûriyê û Îraqê dikin armanc, mebesta wan ji van êrîşan ew e ku Emerîka neçar bikin ji navçeyê vekişe û meydanê ji bo wan vala bike.
Endamê berê yê Kongirêsa Emerîkî Ed Royce ragihandibû, rêveberiya Serokê Emerîka Joe Biden ji Sûriyê venakişe di dema ku rûbirûbûna ligel Îranê û milîsên ser bi wê ve li navçeyê zêde bûye. Wî kongirêsmanê Emerîkî got, ew tiştên hatine belav kirin di rêya medyaya Emerîkî de derbarê vekişandina hêzên Emerîkî ji Sûriyê jêdera wê hin enamên kongirês yên rastrewên tundrew bûye. Ed Royce tekez kir, piraniya Kongirêsêreddikin hêzên Emerîkî ji Sûriyê bêne vekişandin.Parêzerek ji Rojnameya Kurdistan re derbarê vê pirsê wiha dibêje”Di baweriya min de Emerîka bi vê lezatiyê ji Sûriyê dernakeve, û heger hêzên xwe ji Sûriyê vekişîne dê meydanê ji bo her yek ji Îranê û milîsên ser bi wê ve û Rûsiya re vala bike, wê demê dê ti hebûna wê li navçeyê nemîne, û hejmûna wê jî kêm dibe, lewma pêwîste Emerîka steratejiya xwe li vê devera me biguherîne û hebûna xwe ya hertimî li navçeyê bihêz bike bi rêya avakirina bingehên mezin û danîna sîstemên bergiriyê yên pêşketî”.

> «Nabe Emerîka meydanê ji bo Îranê vala bike»



Şirovekarekî siyasî li ser vê pirsê wiha got”Bi nerîna min heger Emerîka hêzên xwe ji Sûriyê û Îraqê vekişîne, dê ewlekariyê navçeyê bikeve jêr metirsiyeke mezin de, û milîsên ser bi Îranê ve bihêz bibin û hejmûna wan jî dê zêde bibe, lewma divê Emerîka li deverê bi awayekî bihêz bimîne, û parastina hevalbendên xwe yên li ser erdê bike, û nehêle bikevin jêr metirsî û êrîşên grûpên çekdar yên ser bi Îranê ve, divê Emerîka sîstmeke bergiriya bihêz li Herêma Kurdistanê û Kurdistana Sûriyê deyne, ji ber bi vê pêngavê rê li ber êrîş û metirsiya van grûpan tê girtin”.
Par, Encûmena Nûneran a Amerîkayê projebiryara vekişandina hêzên Amerîkayê ji axa Sûriyê qebûl nekir. Di projebiryarê de daxwaz ji Serokê Amerîka Joe Bidin hatibû kirin ku hêzên Amerîkî ji nava axa Sûriyê vekişîne û li Encûmena Nûneran dengdan li ser hate kirin. Tenê 103 nûneran dengê erê dan û 321 nûneran jî li dijî wê derketin.Di projebiryarê de hat destnîşankirin ku hejmara leşkerên Amerîka yên li ser xaka Sûriyê ne, 900 keşker in.

> «Divê Emerîka piştevaniya hevalbendên xwe bike»

Lêkolînerek jî wiha derbarê vê mijarê de dibêje”Pirsa vekişandina hêzên Emerîkî ji Sûriyê ji bo propaganda hilbijartinên serokatiya wî welatî tên bikaranîn, û ev yek nayê cîbicîkirin ji ber ku Emerîka bi hesanî meydanê ji Îranê û milîsên ser bi wê ve vala nake, helbet heta niha metirsiya serîhildana rêxistina DAIŞê li deverê heye, lewma Emerîka dê hebûna xwe bihêztir bike û alîkariya hevalbendênx we bike”.





Vanês Mîranî

## Mamê Boto- Kurte çîrok

Dibêjin yek hebû, navê wî mamê Boto bû, her sibeh wî jî berê xwe dida erdê xwe û diçû da cot bikê, ji ber ku berê wextê cot û cobara bûn, berê xwe da erdê xwe û genimê xwe kir di têra xwe de, wê ji xwe re latkî bireşêne û ji xwe re hilke.

Rojekî çû hew nêrî ku Hirçek li ber sekinî.

Got : xêr e!

Dibêje mamê Boto : bi Xwedê toz û icacek wa tê, ew siwarên he li min digerin, bi Quran min bigrin wê min bikujin, hema min veşêre, te çi bivê ser darê dinê, soz ez bidime te, ka ez ê çi bikim çi nekim.

Dibêjiyê : hema xwe bike di têra min de.

Ew jî ne merdî nake û xwe dike di wê têrê de û mamê Boto jî pertalên xwe digiriyê û cilê dewarê xwe jî digiriyê û ka qapûtek kurkek lêye wî jî digiriyê.

Ew siwar e jî tên, ka du siwar in yan neh dehekin yan jî pirtir in.

Dibêjin : qewet be mamo.

Dibêje : erê.

Jê dipirsin : te tu Hirç li van dera ne dîtiye.

Dibêje : Hirçê çi, welah min tu tişt ne dîtiye, ma ka Hirç, ma hûn tiştina li dora min dibînin.

Dibêjinê : naaa.

Dibihorin û riya xwe digirin û diçin.

Heta ku qederek pê ve diçê, Hirç jî derdikevê, û dibêjiyê : de hema xwe kerke min ji te re pêk aniye, ez ê her êvar dûvek yê berana ji te re bînim mala te, û ez ê bidime te, lê bi mercê ku tu ji kesekî re nebêjî.

Bê guman kêfa wî jî gelekî tê, qey ew jî reben û feqîrekê Xwedê ye.

Êvarê ew û jinik wê di mal de rûniştin, qey saet pênc şeş e piştî mexrebê ye, li dora eşayê ye.

Mane dibêjin berê yê xaniyê wan heyî wek menfezekî çêdikirin, ji xwe re wek kozikî, ango tepik ba yan kawîr û dar ba, li şûna van sopên dû derêxin, vêca ew dû di wê qularê re derdiket û diçû, ew û jinik wên rûniştin, ji xwe re civat girtine û rûniştine, hew nêrîn ku dûvek yê berana evê tirtir e, evê herî paqij, got şelp û li ber wan ket, jinikê bazda xwe da dera he, û got : kuro ev çi ye Boto.

Boto got : hiş, hema xwe kerke, rizqeke û Xwedê ji me re rêkiriye.

Rojekê diduwa sisiya çara pênca şeşa, jinik e divê bidê pinpinê, rabû gotiyê : bi Xwedê tu ji min re nebêjê qîma min nayê divê ez bizanim ka ev çi ye !?

Hirç jî dema wî dûvê berana tavêje, helbet guhdariya wan dike heke li pişt xanî yan li pişta ka çiya wan e, heta herdu pal didin ango dinivin, ka wê ji hevjîna xwe re bibêje yan jî nabêje.

Rabû got : hirmet çi ji Xwedê çi ji beniya, bi Xwedê hal û hewalê min û Hirçekê ev e...

Eha min ev qencî pê kir, û wê jî ev qencî ye bi min kiriye, soz ji min re daye ku dûvekî berana her roj ji min re bîne.

Dibêjin Hirçê ji pişta xanî ban kir, wa mamê Boto.

Wî jî got : haaa.

Hirçê got : ne tu yê her sibê bê coto, bi Xwedê ez ê li te bikim Melkemoto.

Mamê Boto got : ehaa .. hirmet, te dît, ma min negote te, bi Xwedê ve te rizqê me jî qutkir, ka wê çawa be sibê.

Ew jî sibê rabû û dewaroka xwe barkir û du sê tenek e genimê xwe avêt ser piştê û kire di têrê de û her bi dilekî kul û pazdehê pelixî berê xwe da cot û li wan kendalan,çavê xwe gerand, ka li wan derane yan na, nêrî ku Hirça malê wa li serê late ye, wa sekinî, li bendê maye, belê mane wî soz dabû ku nebêje kesî, lê ji jinikê re gotibû, bandike mamê Boto.

Mamê Boto lê vedigerîne û dibêje : haaa.

Hirç dibêje : ve tu hatî ez li hêviya te me, ma tu yê ji ber destê min kû ve xilas bibe.

Boto jî rabû got : ma qey tu pê nehisyayî.

Gotiyê : naaa.

Boto got : welah ez niho ji wê ve dihatim hinek siwar li wê dera hebûm, û li ser wan ketin û gotin : Hirçek winda bûye em lê digerin, bi Xwedê ku em bibînin hema em ê wê bikujne, hema nexwa tu yî ji te pê ve li rex min nînin.

Hirçê got : gelo ez çi bikim.

Got : hema xwe bike di têra min de dîsa wek berê, ez ê te bike di têrê de me wek cara dî, û serê te sax.

Dibêje : de hema xem nake.

Radibe xwe dike di têrê de.

Boto jî bi sipehî devê têrê bi aşûjinê û benê dirêj yê bi têrê ve dirût û dest avête xencerê û dikevê di ser kelaxê Hirçê de, rep û hey rep têr lê dide heta Hirça malê dikujê, û ji xwe re dibêje : ehaaa bi Xwedê ev e!

Ew î jî qencî pê kir.


Wê jî qencî pê kir.

Û jinikê xirabî bi herdiwan kir.

Rizqê xwe jî qutkir û ew heywan e jî kuşt bê sûnc û bê sebeb.

Qewlê me çû deştê, dê û bavên me çûn behiştê, du kulav li ber teniştê.

## Kezî zerê



Hiyam Ebdulrehman

Kezî zerê simbilî  
Baxê welat harkirin  
Liser milan herikîn  
Çivîk ji xew rakirin  
Ba biskan dihejînin  
Bihevdûre şehkirin  
Zulfan berê xwe dan hev  
Pêkre ceng û şer kirin  
Havîne zêr û zîvî  
Palevane das birin  
Herdû çavê zeyîtûnî  
Awir jiwan mukurin  
Şekrokin lêvan bê deng  
Çi sirûdan distirn  
Xecxecokê li dêman  
Jiwir rengê xwebirin  
Rastî nize çi bêjim  
Baxê sînga bo şirin  
Dantêl û herîr şaş man  
Xwe libejnê nagirin  
Mehrîbanbe zalimê  
Te xelk hemî dînkirin



Şiyar Alyanî

## Cindirês

Dunya zivistan û sar e  
Dîsa Efrîn birîndar e  
Tê ji bin kavil û dîwar e  
Qêrîn û gazî û hawar e  
Cindirês bi girî û şîn e  
Hewar û qîr û nalîn e  
Şeşê sibatê bi xemgîn e  
Rê li ber wa tev girtîn e  
Felek jî bi me re  
neyar e  
Ji dijmin re dost û yar e  
Her demî bi kîn û ar e  
Dijî feqîr û hejar e  
Hestê dilê te mirîn e  
Goh û çavê te girtîn e  
Nabînê dax û birîn e  
Ji kurdare har û dîn e  
te em hiştin bê mal û cî  
Mal wêranbû jin bûne bî  
Te ji me birin pir  
xweştivî  
Bin axbûne bisk û kezî  
Te şar û gund tev  
wêran kir  
Welat bi carek  
xembarkir  
Dil û ceger pêt û ar kir  
Ji kul û kesera bêzar kir  
Em miletekî zindîn e  
Xilasnabin bi erd  
hejîn e  
Li cîhanê bê xwedîn e  
Nayên hev cihê birîn e